

ZANISTNAMEya Felsefeyê



Çapa pdf. ya gotara

Federalîzm

Nivîskar: Andreas Follesdal

Wergêr: Fexriya Adsay

Edîtor: İbrahim Bor

Follesdal, Andreas. “Federalîzm”. *Zanistnameya Felsefeyê* (Payîza 2025ê). Fexriya Adsay (Wergêr). Lînk = <<https://zanistname.com/nk/entries/federalism>>.

Navnîşana gotara orjînal li *Ansiklopedîya Felsefeya Stanfordê*:

Follesdal, Andreas, “Federalism”, *The Stanford Encyclopedia of Philosophy* (Winter 2022 Edition), Edward N. Zalta & Uri Nodelman (eds.), URL = <<https://plato.stanford.edu/archives/win2022/entries/federalism/>>.

Perbendî: Arvand Salari

Hemû mafên vê berhemê parastî ne ji aliyê *Zanistnameya Felsefeyê* ve.

<https://zanistname.com/>

Federalîzm

Andreas Follesdal

Wergêr: Fexriya Adsay

Federalîzm, teorî an berevaniya rêgezên federal in, ên ji bo parvekirina desthilatdariyê di navbera yekeyên endam û saziyên hevpar de. Ji dewleta unîter cuda, serweriya di siyaseta federal de ne-navendî ye, gelek caran ji aliyê makezagonî ve, di navbera kêmtirîn du astan de parvekirî ye ku yekeyên di her astê de xwedî otorîteya nîhayî ne û di hin meseleyan de dikarin xwe bi xwe bi rê ve bibin. Bi vî awayî, welatî berpirsyariyên wan î siyasî an mafên wan hene ku ji aliyê her du otorîteyan jî tèn garantîkirin. Dabeşkirina desthilatdariyê di navbera yekeya endam û navendê de dikare biguhere, piranî navend xwedî desthilatdarî ye di warê siyaseta berevaniyê û karên derve de, lê yekeyên endam dikarin rolên wan î navneteweyî jî hebin. Organên biryargirtinê yên yekeyên endam dikare di organên biryargirtinê yên navendî de jî cî bigrin. Bala felsefî ya demên dawî xurt dibe ji ber elaqeya siyasî ya bo federalîzm û encamên surprîz ên mînakên taybet, û ev bal duqat dibe bi peydên ampirîk ên derbarê bingeha zerûrî û rewa ya ji bo îstiqrar û baweriya navbera welatîyên di nîzama siyasî ya federal de. Tevkariyên felsefî li ser wan dubendî û derfetan sekîne, yên li wan herêmên mîna Kanada, Awistralya, Ewropa, Ûrisya, Iraq, Nepal, Nijerya, ku nîzamên federal wek çareseriyên balkêş tèn dîtin ji bo lihevanîna cudatîyên navbera gelên ji ber îhtilafên etnîk an çandî dabeş bûne lê dîsa jî li dû nîzameke hevpar, demokratîk, siyasî ne.

- 1. Taksonomî
- 2. Dîroka Federalîzmê
 - 2.1. Hin riwangeyên global
 - 2.2. Tevkariyên rojavayî

- 3. Sedemên Federalîzmê
 - 3.1. Sedemên ji bo nîzameke federal li şûna dewletên cihê an veqetînê
 - 3.2. Sedemên tercîhkirina nîzamên federal ji dêvla dewleteke unîter
- 4. Mijarên din ên Felsefî
 - 4.1. Serwerî an federalîzm
 - 4.2. Mijarên Makezagonî û Sêwirandina Sazûmanî
 - 4.3. Çavkaniyên Îstikrarê
 - 4.4. Dabeşkirina Hêzê
 - 4.5. Parvekirina Edaleta
 - 4.6. Teoriya Demokratîk
 - 4.7. Siyaseta Nasînê
- Çavkanî
 - yên dîrokî
 - yên hevçax
- Çavkaniyên din ên Internetê

1. Taksonomî

Gelek xebatên biqedir bi hûrgilî rave dikin van têgehên navendî, ‘federalîzm’, ‘federasyon’ û ‘sîstemên federal’ (Wheare 1964, King 1982, Elazar 1987, Elazar 1987a, Riker 1993, Watts 1998).

Nîzameke siyasî ya federal li vir wek “awayeke birêkxistina siyasî ku rêvebiriya hevpar û rêvebiriya xweser bi ser hev vedike” tê qebûlkirin (Watts 1998, 120). Federalîzm, teorî an parastina nîzameke wisa ye rêgezên dabeşkirina otorîteya nihayî ya di navbera yekeyên endam û saziyên hevpar de jî tê de.

Federasyon cûreyek nîzameke federal a wiha ye; cûreyên din sendîka, konfederasyon, tifaq û yekitiyên nenavendî -û melezên mîna Yekîtiya Ewropaya niha- ne (Elazar 1987, Watts 1998). *Federasyon*, bi vê maneyê dabeşbûneke

teritoryal a desthilatdariyê dihewîne di navbera yekeyên pêkhate ku carna wek ‘wilayet’, ‘kanton’, belkî ‘bajar’, an ‘eyalet’ tên binavkirin, û hikumeteke hevpar de. Ev dabeşbûna desthilatdariyê tê qewîkirin bi makezagonê ku ne yekeya endam ne hikumeta hevpar nikarî yekalî biguherîne. Yekeya endam û hikumeta hevpar herdu jî li ser welatiyan yekser bandor dikin -hikumeta hevpar “li ser welatiyên takekes ên neteweyê pêk tînin” karîger e (Federalist Paper 39)—û rayedarên herduyan jî bi awayekî yekser tînin hilbijartin (Watts 1998, 121). Lê, otorîteya nenavendî ya dewletên unîter dikare bi awayekî kêfî bê îptalkirin ji aliyê meclîsa zagondaner a navendî. Gelek şewazên pîrmerheleyî yê rêvebirinê jî dikare ji aliyê yekeyên merheleyekê bînin nûkirin bêyî rizaya organên merheleyên din. Ligel van qewîkirinan, hin navendîbûn gelek caran ji ber şîroveyên makezagonî yê dadgeheke federal a ji bo çareserkirina îhtilafên derbarê vegiriyên otorîteya nihayî ya zagondaner û/an adlî, peyda dibin.

Li aliyê din, ‘konfederasyon’ hatiye maneya nîzameke siyasî ku navenda wê ji ya federasyonê lawaztir e û pirî caran girêdayî yekeyên pêkhate ye (Watts 1998, 121). Bi awayekî tipîk, di konfederasyonê de a) yekeyên endam bi awayekî zagonî dikarin derkevin, b) navend tenê otorîteya ji aliyê yekeyên endam hatiye dewrîkirin, diemilîne, c) navend di gelek mijaran de tabiyî vetoya yekeya endam e, d) biryarên navendê yekeyên endam girê dide, lê welatiyan yekser girê nade, e) navend ji navendeke serbixwe ya malî an hilbijartinê bêpar e, *û/an* f) yekeyên endam bi awayekî mayînde otorîteyê dewrî navendê nake. Konfederasyon pirî caran xwe dispêre peymanên ji bo peywirên taybet û hikumeta hevpar dikare ji aliyê delegeyên hikumetên yekeya endam bê sepanîn. Loma gelek jê dikaribû wek konfederasyon bînin hesibandin; eyaletên Amerikaya Bakur di maweya 1776-1787an de, Swîsreya 1291-1847an û Yekitiya Ewropayê ya niha -herçiqas çendîn hêmanên wê yê aidi federasyonan hebe jî.

Li *(kon)federasyonên sîmetrîk* yekeyên endam xwedan heman baqên hêzan e, li *(kon)federasyonên asîmetrîk* ên mîna Ûrîsya, Kanada, Yekitiya Ewropayê, Spanya an Hindistanê baqên hêzan dibe ku cuda be li nav yekeyên endam; hin endam dibe ku, wek mînak, mafên wan î taybet hebin di warê zimên an çandê de. Hin sazandinên

asîmetrîk di navbera eyaleteke piçûktir û yeka mezintir de pêk bê; ya piçûktir tevlî ya mezintir dibe di rêvebirinê de lê di hin mijaran de serweriya xwe didomîne (Elazar 1987, Watts 1998).

Kategorîzasyonê bikêr a sazandinên federal derbarê tekiliya navbera yekeya navendî, yekeya endam û takekesan e. Eger biryarên ji navendê qet yekeyên endam nehewîne, em dikarin qala federalîzma *cihê* (*veqetî* an *kompakt*) bikin. DYA gelek caran wek mînak tê dayin, ji ber ku du Senatorên ji her eyaletî ne ji aliyê rayedarên yekeya endam (yanê Eyalet), ji aliyê hîlbijêrên ku yekser ji aliyê welatîyan tîndengdan, tîndembijartin an temsîlkerin -lê ev bi biryara yekeya endam e (Makezagona D.Y. Made II, Beş 1; Dahl 2001). Federasyon dikarin yekeyên endam daxilî biryargirtina navendî bikin, herî kêr bi du awayên cuda yê şêwazên cûrbicûr ên federalîzma *bihevgerêdayî* (an *hevkar*). Nûnerên yekeya endam dikare di organên navendî de cî bigre -di kabîne an meclîsên zagondaner de- (*saziya hevpar* sazandina *lihevciwandinê*); ya din, pîrî caran yek organeke navendî pêk tînin; bi organên din î bi vî rengî re didin distînin, wek mînak, nûnerên hikumeta yekeya endam Meclîseke Jorîn pêk tîne û hêza wê heye ku veto bike an biryarên pîrîneyê an pîrîneya mevsuf taloq bike (*saziya dabeşbûyî/sazandinên tîkîldar*). Ev sazandinên zagonî rê vedike li ber cûreyên rêvebirinên pîr-ast: mizakereyên berdewam ên nav rayedarên astên cuda yê terîtoryal (Marks 1993, Hooghe and Marks 2003, Scharpf 1983). Dilxwazîtiya bo takekesan dikare ji federalîzma dinavhev îstifade bike, lê pîrî caran bi berdêla şefafî û mecbûriyeta hisabdayinê.

Çendîn nivîskar du pêvajoyên têra xwe cihê pênase dikin, ku rê vedikin li ber nîzameke siyasî ya federal (Friedrich 1968, Buchanan 1995, Stepan 1999 û yê din). Dewletên serbixwe dikarin hêzên xwe yî serwer ên hin qadan dewr bikin an bikin yek û bîn ba hev ji bo menfaetên ku bi awayekî din nikarin bi dest bixin, wek ewlehî an refaha aborî. Ev nîzamên siyasî yê federal ên *hatina ba hev* bi gelemperî tîndirustkirin da ku hêza navendê sînordar bikin an nehêlin pîrîne yekeyeke endam pûç bikin. Mînakên vê DYaya niha, Kanada, Swîsre û Awîstralya ye. Nîzamên siyasî yê federal ên *parçenebûnê* ji dewletên unîter derdikevin, ji ber ku hikumet otorîteyê dewr dike da ku bêhîzûrî an tehdîdên veqetîne yê kêrîneyên li herêmekê kom bûne

sivik bikin. Nîzamên siyasî yên federal ên bi vî rengî pirî caran hin qadên taybet ên serweriyê (mîna mafên zimanî û çandî) didin hin yekeyên endam di federasyoneke *asîmetrîk* de, lê qadeke fireh a kirarê dihêle ji hikumeta navendî re. Mînakên vê Hindistan, Belçîka û Spanya ne.

Tevî nîzamên siyasî yên federal ên herêmî, alternatîfên din î balkêş ên dewletên unîter peyda dibin dema yekeyên endam ên *ne-herêmî* (*non-territorial*) tîrên dirustkirin ji aliyê komên xwedan taybetmendiyên hevpar ên etnîk, olî an yên din. Carna ji van sîstemên re federasyonên ‘ne-herêmî’ tê gotin. Karl Renner û Otto Bauer li ser van sazandinên ji bo kêmbûnê çandî yên belavbûyî sekinîne, ku hin xweseriya çandî û “şexsî” dide wan bêyî ku xwerêvebirineke herêmî hebe (Bauer 1903; Renner 1907; Bottomore û Goode 1978; Tamir 1993 û Nimni 2005). *Lihevkomên*, li nav yekeyên endam, ji komên bi awayekî ji hev dûr ketine pêk tîrên û, tevî vê, li saziyên navendî yên gelek caran ji pirîneyê bêtir bi yekdengî tîrên birêvebirin, tîrên temsîlkirin (Lijphart 1977).

2. Dîroka Federalîzmê

Elaqeyeke berbelav a li nav filozofên siyasî bo babetên derbarê netewe dewleteke navendî kir ku tevkariyên dîrokî yên bo serweriya unîter jî balê bixşînin. Lê em dikarin herkeke biîstikrar a tevkariyên bo felsefeya federalîzmê jî bibînin ji wan kesên bi angaşên xwe yî derbarê hêza navendî tîrên nasîn (ji bo xwendinên bi vî rengî, bnr. Karmis û Norman 2005).

Piraniya lîteratura rojavayî ya li ser federalîzmê li ser yekeya dewletan hûr dibe. Ji bo bixêzkirina vê pêşdarazê, pêşî li pratîkên ne-rojavayî û teoriyên taybetmendiyên federal binêrin.

2.1. Hin riwangeyên global

Li gelek kîşweran em şewazên federal ên birêxistinbûna federal û di çavkaniyên nivîskî yên seranserî nerîta felsefî de tevkariyên bo teoriyên derbarê federalîzmê

dibînin. Rêza tevkariyên felsefî binxêz dikin ku riwangeyên federal dikare li gelek yekeyên xeynî dewletên serwer ên di fikra ewropî û D.Y. de jî dikare bên sepanin.

Rêxistina eşîrî, Māori ku vêga li Zelandaya Nû ji komên malbatan (*whanau*) pêk tê; ev malbat bi hev re dixebitin û wek klanek (*hapū*) ji bo berevaniya xwe hevkarî dikin. Eşîr (*iwi*), ji bo berevaniya hevpar wek federasyoneke çendîn hapūyan dixebite (Ballara 1998, 19).

Çendîn civakên afrikî ku qelîhîne, hêmanên wan î federal hebûn. Edward Wamala tiştên em wek taybetmendiya federal dizanin teswîr dike ji bo civaka Ganda ya berî sedsala 14mîn; paşê ev der bû qraliyeta Baganda ku niha parçeyek ji Ugandayê ye. Binyadên hêza navbera reîs (*ssabataka*) û serokeşîran (*mutaka*) *primus inter pares* bû. Eşîr parêzbendiya wan hebû da ku yekeyên jorîn berpirsariyên yekeyên jêrîn xesb nekin, tenê refaha yekeyên jêrîn teşwîq bikin (Wamala 2004: 436–437).

Çanda Nahua (Aztek) federalîzma pir-ast nîşan dide: Tlaxilacalli - wergera wê zehmet e, dikare wek “tax” bê famkirin- tabiyî otorîteya serweriya rêvebiriya herêmî, an *altepetl* e ku dûre mezin dibe, dibe parêzgehên pir ên otonom (*huei altepetl*) û dawî dibe împêratorî. Di her astê de, îtaet dibe berdêla otonomiyê, her cure teşebisa navendîkirina yekser a rêvebiriya tê qutkirin (Johnson 2017). Di tifaqa sêcarî ya 1428an de, ya ji bo armancên leşkerî ya navbera sê bajar-dewletan (*altepeme*), Tenochtitlan, Texcoco û Totoquihuatzin, her yek ji van *altepetla* xwe ya bende bi rê ve dibe bêyî midaxeleya herduyên din (Lockhart 1992).

Filozofê siyasetê yê konfusçusî, Mencius (379–298 BÎ) nîzameke ‘malbatkî’ ya sê-ast danî holê (Chan 2003). Malbat, berpirsariya wê ya mezin lînêrîna wan kesên nikaribûn li xwe binêrin û rêvebir divê dê û bavê xelkê bûya (Mencius 2003, 1B.13). Dema malbat *nikaribe alîkarî bide*, tora civatê divê piştgirî bide. Tenê dema civak *nikaribe*, ew tişt em dikarin bêjin dewlet, *mecbûriyetek* wê heye ku alîkarî bike.

Em derbirînen federalîzmê di sêyemîn şertên islamê de dibînin: mecbûriyeta xêrxwaziya bi riya *zikatê*, dike ku mirov alîkariya kesên muhtac ên derveyî xaneya xwe bike (Qur’an 9: 103). Her mislimanekî bikaribe divê rêjeyeke diyar a serweta

xwe -2.5%- bide ji bo piştgiriya kesên muhtac. Rola dewletê dikare biguhere di nirxdanîn, berhevkirin û belavkirina zikatê de. Li hin welatan, berhevkirin an belavkirina zikatê berpirsyariya rêxistinên civata sivil an mizgeftan e. Li yên din, berpirsyariya hikumetê ye ku dema misliman nikaribin bidin jî zikatê temîn bike; an temama sîstemê dikare ji aliyê dewletê bê îdarekirin (Bilo û Mechado 2018).

Felsefeya Ubuntu ya jêr-sehraiya taybetmendiyên wê federal hene ku tevkariya teoriya hiqûqê jî dike. Têgeha ‘Ubuntu’ ji vê gotina Nguni tê, “*Umuntu ngumuntu ngabantu*” yanê, kesek bi saya kesên din dibe şexs. Ubuntu, têkiliyên ahengdar ên navbera şexsan wek avakara takekes binxêz dike, şefqet û sêdaqata ji bo pêşveçûna hevdu dupat dike (Mbiti 1969, Gädeke 2019, Metz 2011). Peywira hikumetê a di astên cûrbicûr ên terîtoriyal ew e ku geşbûna ahengdar a parçeyên pêkhate û civatê teşwîq bike (Shutte 2001). Ubuntu di epîloga Makezagona Demkî ya Afrîkaya Başûr a 1993yan de cî digirt, lê di Makezagona 1996an de bi aşkerekî cî negirt.

Konfederasyona navbera pênc (dûre şeş) neteweyên Haudenosaunee (Iroquois) diçe dema navbera sedsalên 12 û 15mîn. Makezagona devkî -Zagona Mezin a Aştiyê- nûnerên hilibijartî yên her neteweyê, an *sachem*, ku bi karên navxweyî re mijûl dibûn, diyar dikir. Konseya Mezin a konfederasyonê nikaribû midaxeleyî karên navxweyî yên her eşîrî bike, dikaribû meseleyên taybet ên hevpar ên mîna şer, aşîfî û peymançêkirinê nîqaş bike. Pratîka Haudenosaunee ku parêzbandî bexşî yekeyên endam dikir, diyar e bandor kiriye li banga Benjamin Franklin û yên din a ji bo yekitiya koloniyên ingilîz (Fenton 1998). Iris Marion Young li ser vê nerîte lêkolîn kir da ku teoriyeke federalîzmê dirust bike ku parêzbandiyê têxe bin temînatê û nehevsengiyên hêzê serast bike (Young 2000; Levy 2008).

2.2. Hevkariyên rojavayî

Aristotle (384–322 BÎ) mîna keke pêş a rojavayî ya fikra federal ku hin yekeyên endam ne politîk in, dabîn dike. Peywirên xane an gundan ew e ku pêdiviyên takekesan ên jiyanê têxin bin temînatê. Bajar-dewlet (*polis*) civateke xwe-têrker a xane, klan û gundên wisa ne, ji bo parastin û pêkanîne ne (*Politics*, III.9, 1280b).

Çend kesên ji tevkarên pêşî yên fikra federalîst li ser mantiq û qelsbûna dewletên navendî disekinîn dema di sedsalên 17mîn û 18mîn de peyda bûn û geş bûn. Johannes Althusius (1557–1630) gelek caran wek bavê fikra modern a federalîst tê dîtîn. Di *Politica Methodice Digesta* (Althusius 1603) de angaşt dikir ku ji bo bajarê xwe Emdenê otonomî dixwest, him li dijî Lordê herêmê yê lutheryan him li dijî Împeratorê katolîk. Althusius pir ketibû bin bandora huguenotên fransî û kalvinîzmê. Kalvinîst, wek kêmneyên daimî yên li çendîn dewletan doktrîneke berxwedanê çêkirin wek maf û peywira “serkêşên xwezayî” yê berxwedana li hemberî tîraniyê. Kalvinîstên ortodoks israr dikirin ji bo serweriya derdorên civakî yên tenê tabiyî zagonên Xwedê ne. Huguenotên protestan ên fransî teoriyeke din a meşruiyetê çêkirin û di 1579an de ji aliyê nivîskarekî bi navê mustear, “Junius Brutus” hat pêşkêşkirin di *Vindiciae Contra Tyrannos* (Berevaniya [azadiyê] li hemberî tîranan) de. Gel ku wek organeke yekbûyî ya li civakên hiyerarşîk ên li ser axekê, dihat dîtîn, mafekî wan î ji aliyê Xwedê hatiye bexşkirin heye ku li dijî rêvebiran li ber xwe bidin bêyî ku îdiayeke zagonî hebe. Althusiusê ku teokrasî red dikir, teoriyeke siyasî ya federalîst a nemezhebî û neolî ya peymanger çêkir ku ji bo armanca pêşvebirina baweriya rast be jî midaxeleya dewletê qedexe dikir. Toleransa bo nêrînên mixalîf û çêşîtdariyê di ser her cure menfaetên tabîkirina desthilatdariya siyasî bo dîn, an berevajî wê, re hat girtin.

Ji ber ku mirov mecbûrî kesên din in ji bo dabînkirina ewle ya hewcedariyên jiyaneke rihet û pîroz, em hewceyî civat û komeleyan in ku ji aliyê him amrazî him daxilî girîng in ji bo destekkirina [*subsidiaria*] pêdiviyên me. Malbat, lonca, bajar, parêzgeh, dewlet an komeleyên din meşrûiyet û îdiayên hêza xwe ya siyasî, ji menfaeta takekes a ji otonomiyê bêtir, deyndarê rolên xwe yî cûrbicûr in di dabînkirina jiyaneke pîroz de. Her komele doza otonomiyê dike di nav qada xwe de li dijî midaxeleyên komeleyên din. Althusius, têgeheke bi eslê xwe ji bo tifaqa navbera Xwedê û mirovan dihat emilandin deyn dike û dibêje, komele peymanên sekuler —*pactum foederis*— çêdikin da ku di nav qenciya beramber de bi hev re bijîn.

Hin tevkarên pêşî, qismek ji bo çareserkirina pevçûnên nav-dewletî, li ser

cûreyên cûrbicûr ên nîzamên siyasî yên federal sekinîn.

Ludolph Hugo (li dor 1630–1704) yekemîn kes bû ku di *De Statu Regionum Germanie* (1661) de konfederasyonên li ser hîmê tifaqan, dewletên unîter ên mîna Împeratoriya Roma, û federasyonên bi ‘cot-hikmet’ên bi dabeşbûna terîtoryal an hêzan tên teswîrkirin ji hev cihê dikir (Elazar 1998; Riley 1976).

Endîşeyeke tîrker tengijînên navbera federalîzm û tîgehên serweriyê de bû. Samuel Pufendorf (1632–1684) angaşt kiriye ku dewletên serwer dikarin herî zêde “hemfikir bin ku herdaîm tîkevin nav hev” li konfederasyoneke ku bi yekdengî biryar digre. Derbasbûna bo qaîdeya pirîneyê, nîzama zagonî kir ‘sîstemeke nerêkûpêk’ a nêzîkî dewletekê. Emmerik Vattel (1714–1767) angaşt kir ku ger serwerî tekane warê otorîteya nîhayî û serbixwe be, federasyon ji peymanên dilxwaz ên navbera dewletên bi eslê xwe serbixwe pê ve ne tiştê e. Ramangerên paşê li dijî vê fehma serweriyê derketin, ev nîqaş di warê Yekitiya Ewropayê de heta îro jî didomin (MacCormick 1999, Schütze 2009).

Di *Ruhê Zagonan* (1748) de Charles de Secondat, Baron de Montesquieu (1689–1755) sazandinên konfederal parastin ku baştirînên yekeyên piçûk û mezin ên siyasî tîne ba hev, bêyî ku dezavantajên wan hebe. Li aliyê din, dikarin avantajan dabîn bikin ji bo dewletên piçûk ên mîna beşdariya komarî û azadiya wek ne-zalbûn tê famkirin -yanê, ewlehiya li hemberî îstismarkirina hêzê. Di heman demê de, nîzamên konfederal, bêyî rîskên dewletên piçûk û mezin, dikarin fêdeyên dewletên mezin ên mîna ewlehiya leşkerî bixin bin temînatê. ‘Komareke konfedere’ a tevî cihêbûna hêzan tîra xwe derfet dide homojenî û xweyêkkirina li nav yekeyên endam ên piçûk. Yekeyên endam, tevî mafê veqetînê, tîra xwe hêzan tîne ba hev da ku ewlehiya derveyî tîxe bin temînatê (Book 9, 1). Yekeyên endam dikin ku li ser hev kontrola wan hebe, ji ber ku yekeyên din î endam dikarin midaxele bikin ji bo tepisandina serhildan an îstismara hêzê ya li nav yekeyeke din a endam. Ev tema, nîqaşên derbarê Yekitiya Ewropayê jî tê de, di tevkariyên paşê de jî tîrkerkirin (Levy 2004, 2005, 2007).

David Hume (1711–1776) bi Montesquieu re ne hemfikir bû ku hecmê piçûktir baştir e. Ji dêvla wê, “di demokrasîyeke mezin de ... tîra xwe pisûla û cî heye

ku demokrasî pêş ve bê birin.” Hume di “Fikra Civateke Mikemel” (Hume 1752) de sazandineke federal pêşniyaz dikir ji bo mizakerekirina zagonan ku him yekeya endam him organên zagondaner dihewandin. Yekeyên endam çendîn hêzên wan hene û di biryarên navendî de cî digrin, lê zagonên wan û biryarên dadgehên wan dikare hertim bên pûçkirin ji aliyê organên navendî, loma tê famkirin ku modela Hume ne federal e bi maneya ku li vir tê emilandin. Wî angaşt dikir ku pergalên qeşbalix û ji aliyê cografî ve mezin wê ji bajarên piçûk çêtir bixebitin ji bo rêgirtina li ber biryarên, di aleyhê menfaeta giştî de, xwe dispêrin “entrîka, pêşdarazî an azwer”ê.

Çendîn planên aşitiyê yên sedsala 18mîn ên ji bo Ewropayê sazandinên konfederal pêşniyaz dikirin. Plana Aşitiyê ya 1713yan a Abbé Charles de Saint-Pierre (1658–1743) destûr dida midaxeleya nav yekeyên endam da ku serhildan û şerên li dijî ne-endaman bitepisîne û zorê li wan bike ku tevî konfederasyoneke rûniştî bibin, û ji bo di peymanê de guhertin çêbibe yekdengî lazim bû.

Jean-Jacques Rousseau (1712–1778) pêşniyaza Saint-Pierre pêşkêş kir û rexne lê girt, çendîn şert rêz kirin ku divê hemû hêzên mezin endam bin, mewzûata hevpar divê girêdar be, hêzên hevpar divê xurttir bin ji yek bi yek eyaletan û veqetîn divê derzagonî be. Dîsa, yekdengî lazim bû ji bo di peymanê de guhertin bê kirin.

Immanuel Kant (1724–1804) ji bo aşitiyê konfederasyonek parast di *On Perpetual Peace (Li ser Aşitiya Daimî)* (1796) de. Madeya Duyemîn a Teqez a Aşitiya Daimî dibêje, mafê neteweyan, ji peymanê aşitiyê an dewleteke navneteweyî bêtir, divê xwe bispêre federasyoneke aşitîxwaz a dewletên azad: “Ev federasyon wê armanc neke ku hêzeke mîna ya dewletekê bi dest bixe, ew ê tenê azadiya her dewletê biparêze û têxe bin temînatê, tevî ya dewletên din î konfederal, herçend ku ev nayê wê maneya ku lazim e tabiyî zagonên giştî û hêzeke zorlêker bin, mîna mirovên di rewşa xwezayê de dikirin.

Nîqaşên di warê Konvansiyona Makezagonî ya D.Y. ya di 1787an de geşedaneke zelal e di fikra federal de. Taybetmendiyêke navendî ew e ku federasyon tenê yekeyên endam bi hev girê nade mîna di konfederasyonê de, welatîyan jî bi awayekî yekser bi hev girê dide.

Madeyên Konfederasyona 1781ê ya 13 eyaletên amerîkî yê li dijî Brîtanyayê şer dikirin navendek ava kirin ku pir lawaz bû ji bo îcrakirina hiqûq, berevanî û temînata ticareta di navbera eyaletan de. Ew civîna ku wek Konvansiyona Makezagonî ya D.Y. tê zanîn di 25ê Gulanê-17ê Îlona 1787an de pêk hat. Bi awayekî aşkere tenê bi serastkirina Madeyan ve sînorkirî bû, lê guhertinên bingehîn pêşniyaz kirin. Makezagona pêşniyazkirî nîqaşên berfireh û angaştên derbarê fêde û rîskên federalîzmê yê li dijî sazandinên konfederal gur kir û rê xweş kir li ber Makezagona ku di 1789an de ket meriyetê.

“Antî-federalîst” ji navendîbûna bêusûl ditirsiyan. Diketin tatêlê ku hêzên rayedar ên navendî têra xwe nehatiye sînordarkirin, wek mînak, bi danezaneke mafan (John DeWitt 1787, Richard Henry Lee) ku axir di 1791ê de hat pesendkirin. Ditirsiyan, navend dibe ku peyderpey hêzên yekeyên endam xesp bikin. Yekî din î bi navê mustear ‘Brutus’ bi îlhama ji Montesquieu, guman dikir gelo komarek ji aliyê cografî ewqas mezin û tevî ewqas şênîyên xwedan berjewendiyên bihtilaf, wê rê bigirta li ber tîraniyê û derfet bidaya mizakere û biryarên hevpar ên li esasê zanîna xwemalî (Brutus (Robert Yates?) 1787).

Di *Rojnameyên Federalîst* de James Madison (1751–1836), Alexander Hamilton (1755–1804) û John Jay (1745–1829) bi heraret nîqaş kirin li ser modela pêşniyazkirî ya sazandinên federal ên girêdayî hev (Federalist 10, 45, 51, 62). Madison û Hamilton bi Hume re hemfikir bûn ku rîska tîraniya pirîneyên biazwer hatine kêmkirin li komarên mezintir ku yekeyên endam ên xwedan berjewendiyên hevpar dikaribûn hevdu kontrol bikin û bikirana: “Hêrsa ji bo pere, ji bo betalkirina deynan, ji bo parvekirina wekhev a milkiyetê an ji bo projeyên neguncav an xirab, dê ji endameke wê kêmtir îhtimal hebe ku temama laşê Yekitiyê bipêçe” (Federalîst 10). Hamilton, ligel neqilkirina ji Montesquieu, di wê baweriyê de bû ku dabeşkirina serweriyê di navbera yekeya endam û navendê de wê mafên takekesan jî biparêze li hemberî îstismara rayedarên herdu astan (Federalist 9).

Madison îşaretî belavkirina hêzan kir û piştgirî da ku hinek otorîte bên dewirkirin bo yekeyên endam, ji ber ku herî zêde ew guncav in ku “şertên herêmî û berjewendiyên kêmtir” li ber çav bên girtin an na ji aliyê navendê tî îhmalkirin

(Federalist 37).

Madison û Hamilton banga hêzên navendîkirî yên berevanî û ticareta navdewletî kir (Federalist 11, 23) û bi riya du amrazên nû amaje bi pêdiviya çareserkirina kêşeyên koordinasyon û temînatê yên razîbûna qismî kir: Sepandina navendî û şiyana tetbîqkirina yekser a biryarên navendî li takekesan (Federalist 16, Tocqueville 1835–40 jî diyar kiribû). Bala xwe didanê ku hêza vetoyê ya mîna sazandinên konfederal bexşî yekeyên endam bikin, ji ber ku ew ê navend qels bikira û bibûya sedema “taloqkirinên bêzarker; mizakereya domdar û entrîkayê; lihevkerinên bêheysiyet ên qenciya gişteyê.” (Madison û Hamilton, Federalist 22; û cf. 20).

Ew bi taybetî li ser endîşeyên nehewce yên derbarê navendîbûnê disekinîn û angaşt dikirin ku endîşeyên bi vî rengî divê ne bi sînardarkirina hêza qadên têkildar ên mîna berevaniyê, bi lihevanîna otorîteya navendî li ser bên sekinandin (Federalist 31). Ev jî gotin ku gel wê bêtir “hezkerin, rêz û hurmet” nîşan bide bo hikumeta yekeya endam ji ber zêdetir-xuyakirina wê ya di îdarekirina rojane ya sûc û edaleta sivil de (Federalist 17).

John Stuart Mill (1806–1873) di 17mîn beşa *Nêrînên li ser Birêvebirina Temsilî* de federasyon pêşniyaz dikir ji bo “qismên mirovayetiye” yên hez nakin di bin rêvebiriyê hevpar de bijîn, da ku rê bigrin li ber şerên di nav xwe de û xwe li dijî êrişkariyê biparêzin. Wî têra xwe selahiyet jî didan navendê da ku hemû menfaetên yekitiyê bixe bin temînatê û nehêlin li ser sînoran bac bê stendin ji bo hêsankirina ticaretê. Sê şertên pêwîst rêz dikir ji bo federasyonekê: fehmberiya beramber a “nijad, ziman, ol û, berî her tiştî, saziyên siyasî ku herî zêde dibin sedema hesta hevparbûna berjewendiyên siyasî”; ti yekeya endam ne xurt be bi qasî ku hewceyî yekitiyê çênebe ji bo berevaniyê û teşwîq neke ku veqete; û wekheviya hêza qebe li nav yekeyên endam da ku zalbûna navxweyî ya yek an du yekeyan çênebe. Mill wek fêdeyên federasyonan, îdia kir ku federasyon hejmara dewletên qels kêmtir dike loma meyla êrişkariyê jî kêmtir dike, dawî li şeran tîne û sînardarkirinên li ser ticareta navbera yekeyên endam radike; û federasyon kêmtir êrişkar in, hêza xwe tenê ji bo berevaniyê diemilînin. Û yek ji fêdeyên federasyonan -û bi giştî otorîteya bînavendkirî- ‘tecrubeyên jiyanê’ ye.

Pierre-Joseph Proudhon (1809–1865), *Du Principe fédératif* (1863) de berevaniya federalîzmê dikir, ku baştirîn rêbaz e ku azadiya takekesî tê parastin li nav civatên ‘xwezayî’ yên mîna malbat û loncayan ku di navbera xwe de peyman çêdikin ji bo pêdivî û armancên taybet. Dewlet, bêyî otorîteya nihayî, tenê yek ji çendîn kirdeyên ne-serwer e di koordînekirinê de.

Proudhon hişyar bû li hemberî navendîbûnê; nivîskarên mîna Harold Laski jî hişyariya ‘Kevnbûna Federalîzmê’ didan (1939). Aloziyên girîng ên mîna ji rûyê ‘kapitalîzma dewasa’ bêtir hewceyî bersivên navendîtir in, ku sazandinên federal nikarin bînin cî.

Hizrên felsefî yên li ser federalîzmê dema Duyemîn Şerê Cîhanê û piştî wê ji ber hin sedeman bêtir hatin rojevê. Altiero Spinelli û Ernesto Rossi bang kirin ji bo dewleteke federal a Ewropayê di *Ventotene Manifesto* de ku di 1944an de çap bû. Dewletên totalîter, navendîkirî û şerên bêdawî yên navbera wan şermezar kirin. Ji dêvla wê, divê kontroleke têra xwe parvekirî hebûya li ser hêza leşkerî û aborî, lê “her Dewlet wê otonomiya jê re lazim biparêze ji bo derbirîna plastîk û geşkirina jiyana siyasî ya li gor taybetmendiyên taybet ên gelên cûrbicûr.” Gelek kes Yekitiya Ewropayê li gor van rêzikan rave dikin û rewa dibînin, lê hin kes jî bêtir rexneyî lê dinêrin.

Hannah Arendt (1906–1975) him totalîteryanîzm him komkujiyên îndustrîyelkirî bi qisûrên modela netewe-dewleta serwer ve girê da. Him ji înternasyonalîzma lîberal him realîzma siyasî biguman bû, ji dêvla wan ji bo modeleke fedaral a Komarhez an cureyeke îdeal ku “yekeyên federasyonê hêzên hevdu beramber kontrol bikin” îsrar kir (Arendt 1972).

Derketina hêzên kolonyal jî li dû xwe dewletên pir-etnîk hiştin ku hewceyî çareseriyên afirîner bûn ku xwe-rêvêbirin û rêvêbiriya parvekirî bi hev re bimeşînin (Karmis û Norman 2005). Ya din, globalîzasyonê tenê întegrasyon û harmonîzebûn teşwîq nekir, -qismek jê wek bertek- lêgerînên ji bo rêbazên parastina xwe-rêvêbiriya herêmî jî teşwîq kir (Watts 1998).

Geşbûna Yekitiya Ewropayê û bertekên li dijî şewazên wê yî taybet û

întegrasyona zagonî yek ji sedemên sereke ye ku bala li ser felsefeya federalîzmê nû kir. Nîqaşên dawî yên felsefî li ser çendîn mijaran sekinîn, mîna sedemên federalîzmê û balkişandina ser çavkaniyên îstikrar û bêîstikrariyê; dabeşkirina rewşa ya hêzê di navbera yekeya endam û navendê de; edaleta belavker, tehdîdên bo teoriya demokrasiya qebûlkerî û endîşeyên derbarê siyaseta nasînê.

3. Sedemên Federalîzmê

Gelek angaştên ji bo federalîzmê wek nerît ji bo teşwîqkirina şewazên cuda yên azadiyê yên di şiklê ne-zal, parêzbandî an derfetên zêdekirî de hatin berpêşkirin (Elazar 1987a). Dema em li ser sedemên di lîteraturê de ji bo nîzamên siyasî yên federal hatine pêşkêşkirin, dinêrin, gelek jê alîgirên bînavendkirinê xuya dikin bêyî hewcedariya rûniştina makezagonî ya dabeşkirina otorîteyê. Du cure angaşt hene: Angaştên alîgirên nîzamên federal bi miqayesekirina bi veqetîn û dewletên serwer ên bi temamî serbixwe re; û angaştên, ji dewleteke unîter a (zêdetir) navendîkirî bêtir, piştgiriya sazandinên federal dikin. Bi awayên cuda û ji destpêkên cuda peyda dibin, berevaniya federalîzma ‘lihevkomîyên’ dikin û di lehê federalîzma ‘bihevrehîştin’ê de ne.

3.1. Sedemên ji bo nîzameke federal li şûna dewletên cihê an veqetînê

Çendîn sedemên pêşniyazkirî hene ji bo nîzameke federal li şûna dewletên cihê an veqetînê.

- Federasyon dikarin hedefên dewletên serwer sivik bikin bi riya dewrkirina hin hêzan bo organeke hevpar, mîna teahudên pêwle, cureyên diyar ên koordînasyonê yên ji bo ‘malên giştîyî’ yên cûrbicûr têxe bin tîmînatê û ji bo kontrolkirina tesîrên ji derve ku li aliyên din bandor dikin. Ji ber hevkarîya di hin qadan de dikare ‘di ser re here’ û taleban biafirîne ji bo koordînasyona di hin sektorên din de, federasyon pirî caran hêdî hêdî ber bi navendîbûnê ve diçe. Ji bîr mekin ku hin ji van hedefan hewceyî parvekirinên selahiyetan û mafên xalên vetoyê ne di nav nîzamên federal de. Hekena, ji bo hin hedefên

hevpar ên têkel, mîna kêşeyên hawirdorê, taybetmendiyên federal dikare bibin parçeyek ji pirsgirêkê (Adler 2005, Dalmazzone 2006).

- Federasyon dikarin aşitiyê bi çendîn awayan teşwîq bikin bi rêlibergirtina şeran û tirsra şeran. Dewlet dikarin têkevin (kon)federasyonekê da ku bi hev re têra xwe xurt bibin ku êrişkarên ji derve jê vegeirînin û/an rê bigrin li ber şerên êrişkar û şerên bergir ên li nav xwe. Federalîstên ewropî Altieri Spinelli, Ernesto Rossi û Eugenio Colorni di *Ventotene Manifestoya* 1941ê de angaşt dikirin ku: Tenê federasyoneke ewropî dikare rê bigre li ber şerê navbera dewletên totalîter û êrişkar. Angaştên bi vî rengî, helbet, pêşbînî dikin ku (kon)federasyon wê ji her yek dewletê bêtir êrişkar nebe, Mill jî ev angaşt dikir.
- Federasyon dikarin *refaha aborî* jî pêş ve bibin bi rakirina astengên li ber ticaretê, bi riya aboriyên pîvek, bi riya çêkirin û berdewamkirina peymanên ticaretê yên navbera yekeyên endam an bi bûyina lîstikvaneke têra xwe mezin a global ku bandor bike li ser rejimên ticaretê yên navneteweyî (ji bo ya dawî û YE, bnr. Keohane û Nye 2001, 260).
- Sazandinên federal, bi riya sînardarkirina serweriya dewletê û bi dewrkirina hin hêzan bo navendê, dikarin takekesan biparêzin li dijî rayedarên siyasî. Ya din, dikarin otorîte bidin navendê ku midaxeleyê yekeyên endam bike û bi vî awayî dikare mafên mirovî yên kêmnê biparêze li dijî rayedarên yekeya endam (Federalist, Watts 1999). Helbet, angaştên bi vî rengî difikirin ku îhtimala îstismarkirina navendê wê kêmtir be.
- Sazandinên federal dikarin *nifûza siyasî* ya hikumetên berê serwer zêdetir bike, him bi riya koordinasyonê û -nexasim ji bo dewletên piçûk- him bi bexşkirina nifûzê, heta mafê veto, bo van yekeyên endam da ku, ji dêvla ku tenê wek wergirê siyasî bimeşin, bikaribin li ser siyasîkirinê jî bandora wan hebe.
- Nîzamên siyasî yên federal dikare wek şewaza guncav a rêxistinên dinavhevde bîna tercîhkirin, wek mînak di nav têgehên 'organîk' ên nîzama siyasî û civakî. Federasyon dikare hevkarîyê, edaletê û nirxên din ên navbera û nav yekeyên endam, yên navbera û nav yekeyên xwe yî pêkhate teşwîq bike, wek mînak, bi

riya çavdêrîkirin, zagondanerî, sepanandin an peymanên malî, mafên mirovan, parêzbendiya ji midaxeleyê an geşbûnê. Her yekeya mezintir berpirsyar e ku ji malbatê dest pê bike û pêşveçûna yekeyên endam hêsantir bike û têxe bin temînatê wan qencyên hevpar ku bêyî otorîteyê hevpar xwe nagihênê. Angaştên bi vî rengî ji aliyê nivîskarên din î cihê, mîna Althusius, nerîtên katolîk ên dewrîkirina selahiyetê yê mîna Papa Leo XIII (1891) û Papa Pius XI (1931), û Proudhon hatine îfadekirin.

3.2. Sedemên tercihkirina nîzamên federal li şûna dewleteke unîter

Çendîn angaşt hene ku, ji dêvla dewleteke unîter, dikare ji bo alîgiriya nîzamên federal bîn emilandin. Di nav zehmetiyên ji bo hin ji van angaştan de mesele ew e ku otorîte wê çawa bê tehsîskirin dema daxwazên dijberî hev hebin ji bo dabînkirina berjewendiyên cuda ji bo komên qismen li hev dikevin (*overlapping*); û di rewşên acil de, mîna pandemiyan, bêhukimkirin wê çawa bê sazîkirin (Steytler 2021). Ger em ne hemfikir bin bi Schmitt re ku pênase dike bê serwer kî ye (Schmitt 1985), girîng e ku wê kî xwedî otorîte be ku biryar bide bê îstisna çî ne.

- Sazandinên federal, bi riya temînkirina parêzbendî û ne-zalbûnê, dikare komên kêmine an neteweyan biparêze li dijî rayedarên navendê. Parvekirina makezagonî ya hêzan bo yekeyek endam takekesan ji navendê diparêze, li aliyê din, sazandinên navhevde, bi riya organên yekeya endam nifûzê dabîn dike li ser biryarên navendê. (Madison, Hume, Goodin 1996). Yekeyên endam bi vî awayî dikarin rayedarên navendê kontrol bikin û rê bigrin li ber kirinên dijî îradeya kêmineyan: “Demokrasiyê mezî divê xwe-rêvebirinê feda bike ji yekitiyê re an wê bi federalîzmê biparêze. Bihevrebûna çendîn neteweyan di bin banê heman Dewletê de azmûnek û baştirîn ewlehiya azadiya wê ye ... Pêkhînanana neteweyên cuda di Dewletekê de bi qasî pêkhînanana mirovan di civakê de şertekî pêwîst ê jiyana medenî ye” (Acton 1907, 277).
- Bi awayekî taybetî, sazandinên federal dikare guncav bin ji bo neteweyên kêmine ku doza diyarkirina çarenûsa xwe, derbirinên hestê xwe yê nasnameya

hevpar û aidiyetê, û parastina çand, ziman û dînê xwe dikin (Carla 2012). Sazandinên otonomî û parêzbendiyê bi awayekî aşkere çêtir in ji pevçûnên siyasî ku dikare ji teşebisên komên wiha yê ji bo veqetîna derkevin. Rayedarên navendê dikarin bi îhlalkirinên mafên mirovan, şerên navxweyî an paqijiya etnîk bertek bidin da ku rê bigrin li ber tevgerên veqetîna yê bi vî rengî.

- Nîzamên federal dikare derfetan zêdetir bikin ji bo beşdarbûna welatiyan di biryargirtinê de; bi riya mizakere û meqamên him yekeya endam him organên navendî ku çêbûna karakterê gerantî dike bi riya beşdariya siyasî li nav bêtir welatiyan (Mill 1861, beş 15).
- Nîzamên federal dikare hînbûnê hêsantir bikin bi riya xurtkirina çareseriyên alternatîf ên ji bo pirsgerêkên hevşib û parvekirina dersên ji laboratuwareke wiha ya ‘azmûnên di jiyane de’ (Rose-Ackerman 1980).
- Federasyon dikarin bi awayekî giştîter tercîha maksîmîzasyona bitesîr hêsantir bikin, mîna di lîteratura federalîzma aborî û malî de bûye fermî -lê gelek angaşten wisa ji federalîzmê bêtir bînavendîbûnê destek dikin. Lêkolînên li ser ‘federalîzma malî’ li ser guncavtîrîn belavkirina otorîteyê disekine, jinûvebelavkirina navendî lê tedarîkkirina herêmî ya malên gişteyî pêşniyaz dike. Sazandinên federal dikare derfet peyda bikin ji bo hevberkirina guncavtîr a otorîteyê ku malên gişteyî biafirîne ji bo tebeqeyên jêrîn ên gelheyan re. Ger tercîhên takekesan bi awayekî sîstematîk li gor herêman biguhere ji ber parametreyên derve û hundir ên mîna cografya an zewq û nirxên hevpar, sazandinên federal—an bînavendkirî— ku destûr didin çêşidariya herêmî, dikare guncavtîr bin ji ber çend sedeman. Biryarên herêmî dike ku barê biryardanêriya navendî giran nebe, û biryardanêrên herêmî dikarin baştir biryara tercîh û alternatîfan jî bidin û xizmeteke çêtir bikin ji ya hikumeta navendî ku di meyla paşguhkirina çêşidariya tercîhên herêmî de ye (Smith 1776, 680). Bexşandina hêzan bo tebeqeyên jêrîn ên gelheyê ku tercîhên wan î di warê xizmetên civakî nêzîkî hev in, dikare bibandortir be, ji ber ku ev tebeqeyên jêrîn dikarin ‘navxweyîbûnan’ û ‘civandina malan’ biafirînin bi bihayên ku tenê ew dikarin rakin (Musgrave 1959, 179–80, Olson 1969,

Oates' 1972 'Teorema Bênavendkirinê').

- Sazandinên federal dikare bibe stare ji bo komên girêdayî axekê û tercîhên wan ji yên gelheyên pirîneyê cuda ne, mîna kêmnîyên etnîk û çandî, da ku marûzî biryarên pirîneya li dijî tercîhên wan nemînin. Sazandinên ne-unîter dikarin givaşê daxin kêmtirîn astê û heta mimkun be ji bo zêdetir welatiyan bibe bersiv (Mill 1861 ch. 15, Elazar 1968; Lijphart 1999). Nêrînen wiha yên derbarê karîgeriya aborî û biryarên pirîneyê dikare di lehê çareseriyên federal de bin, ligel “nedabeşbarî, pîvekên aborî, bandorên ji derve û hewcedariyên stratejîk ... qebûlbar wek angaşten karîgeriyê yên di lehê tehsîskirina hêzan bo astên bilintir ên hikumetê” (Padou-Schioppa 1995, 155).
- Sazandinên federal tenê komên takekesên xwedan nirx an tercîhên hevpar naparêze, dikare rê xweş bike ku livbariya takekesên xwedan tercîhên hevpar teşwîq bike û li herêmekê kom bibin. Otonomiya yekeya endam a ceribandînekê dikare reqabetê gur bike ji bo takekesên ku tercîhên wan herî zêde li kû pêk bê, biçin wir. Livbariyeke wiha ya ber bi yekeyên endam ên takekesên mîna-hev dikare fêdeyên otonomiya herêmî zêde bike di warê dabînkirina xizmetên civakî de—ger aboriyên pîvek û bandorên ji derve tunebin (Tiebout 1956, Buchanan 2001)—lê encam dikare wiha be jî ku ew ên pêdiviyên wan biha û yên kêmtir livbar dikare di rewşeke xirabtir de bimînin.

4. Mijarên din ên Felsefî

Dema dawî, piraniya balê çûye ser mijarên felsefî yên ji peydên ampîrîk ên derbarê federalîzmê derdikevin (ji bo çavgerandineke li lêkolîneke ampîrîk a bi vî rengî, Burris 2015), ev elaqe ji ber dubendiyên têra xwe ji hev cuda yên welatên mîna Kanada, Awîstralaya, Nepal, Etyopya û çendîn welatên ewropî û Yekitiya Ewropayê peyda bûye.

4.1. Serwerî an federalîzm

Tengijînên navbera serwerî û federalîzmê hê jî nediyariyan derdixin holê, ku di fehmên ‘navneteweyî’ û ‘neteweyî’ ya federalîzmê de rû dide (Schütze 2009). Ger serwerî tekane warê otorîteya nîhayî û serbixwe be, nîzamên federal nikarin serwer bin, ji ber ku ‘gotina dawî’ ne ya kesî ye di hemû meseleyên siyasî de (Friedrich 1968), û “otorîte û hêz di nav torek qadan de hatiye parvekirin” (Elazar 1994, xiii). Madison (Federalist Paper 39) û yên nûtir Beaud (2009) û Schütze (2009) jî tê de, nerîteke din hewl dide bi riya cot-serweriyê hevsengiyekê çêbikin. Çendîn tevkariyên bo teoriya siyasî û hiqûqî ya Yekitiya Ewropayê van meseleyan bi aliyên cuda çareser dikin (Bellamy 2019; Schütze 2020).

4.2. Mijarên Makezagonî û Sêwirandina Sazûmanî

